ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIRXAN

Sal 1 — Hejmar 1

Kiriyariya Roja Nû; ji bona erdên Sûriye û Libnanê; 10 lîreyên Sûrî; ji bona welatên din 2 lîreyên ingilîzî. Bihayê Hejmarekê: 10 Qemerî.

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

Duşemb 3 Gulan 1943

Dîwan û gerînendekariya Rojnamê: Bêrût-Birc; We. qîf Tabet, Telefona Dîwanê: 74-0‹; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41· Edresa telg: Bêrût-Rojanû.

MERHELE

Di jiyîna miletan de merheleyin hene û miletê ko dixwaze bigehe tekûzî û medeniyetê û wan li xwe bike, jê ra divêt bide reya wan merhelan û bi wan ra derbas bibe.

Gelo miletê Kurd daye pey wan merhelan û heke daye îro gihaştiye kêjanê.

Delêletên heno ko miletê me berê xwe daye vê reyê û bi gavine giran, bi gavine giraniyê tê re diçe.

Heye ko hon bibêjin ji miletê me re, ji miletekî bişûndemayî re, ne g a v i n e giraniyê lê gavên çargaviyê gerek in, da ko ew xwedi ser marhelan re zer bike û rojkê berî rojekê xwe bigehêne miletên ko di vê bezê de, jê derketine û ew bi şûn de hiştine û ji ber vê bişûndemayîne miletê me bindestiya wan dike û em bûne rajorên wî. Heke we holê got em jî bi we re ne. Lê ev, tiştê gerek e û tiştê gerek xwerû daxwaz e; û ne tiştê destxistî ye.

DAXWAZ Û TIŞTÊ HAZIR

Belê daxwaz ev e, lê tiştê hazir û mewcûd bi awakî din e û silaw li sifra hazir e. Berî sê sed salî Ehmedê Xanî nav di miletê xwe dida û digot:

Enwa'i milel xudan kitêb in
Kurmanc bi tenê di bê hesêb in.

Herçî Evdilqadirê Koyî, di pey Xanî re û berî 50-60 salî, gava temaşa dinyayê dikir û didît ko her tiştên dinyayê guhêrîne û ji xwendinê re jî awayine nû çêbûne û bi tenê, bi xwendina medresan berê Kurdan naçe şerî; dinalî û digot:

Le dewrî ême roman û cerîde
Egerçi meqsed e zimanî baw e.

Belê Xanî digot «Bixwînin»; Koyî li gora wextê xwe, bi ser ve zêde dikir û digot: «Bi awayê nû bixwînin». Lê me ne xwend, gelo çire? Ji ber ko mezin û birewerên kurdan menfeheten xwe ên şexsî di ser menfeheta milet re girtine; ev miletê belengaz wek kerîkî pezdane ber xwe, ew dotine, ji şîrê wî rûn û mast û penîr, ji hiriya wî xeftanine teylesan çêkirine. Xwedê gunehên wan bixefirine. Tiştê ko yar û mezinên me kiriye ev e. Lê rojekê derba neyaran em hişyar kirin. Bi vê derbê me bîra her tiştî bir. Me zanî ko xweseriya me, di zimanê me de ye û em bi tenê bi hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê xwe û bi parastina wî, di civata miletan de, wek miletekî xweser dikarin bijîn û payedar bibin. An ne em ji dara heyîna miletên çarnikar re dibin xuşkî, di rayên wî de digerin û wê xurt dikin. Ji ber ko em bi xesletên xwe ên tebîî ji wan xurtir, zeximtir û paqijtir in. Şûr bi qenciya folayê xwe dibire û diçirise. Lê fola tê de winda ye; nav navê şûr û yê xwediyê wî ye.

Belê, me her tişt bîr biriye û îro gava em li hev digehin hev, bi ax û nalîn, ji hev û du re dibêjin:

«Bavo! li dinyayê ji me kêmtir kes ne maye. Heçî milet hene tev de bûne dewlet û hikûmet, xudan kitêb û dibistan. Bi tenê em, miletê kurd; bi şûn da mane; reben, feqîr, nezan, belengaz, di destên xelkê de lehîstok. Xelkê hevsara me kiriye destê xwe, li gora kêf û menfeheta xwe berê me jî bakur dide nivro, ji roavê dide rohelê. Ji lewre divêt em jî bixebitin xelkê xwe hînî xwendin û nivîsandinê bikin, vî miletê belengaz ji tarîtiyê xelas bikin, berê wî bidin tav û ronahiyê.

Li ser vê gotinê jî em yek in. Lê . . .

KIRIN Û GOTIN:

Lebelê, ji ber ko kirin û gotin ne birayên hev in, di dema kirinê de; destekî xedar me ji hev dike. Wextê gotinê ye. Em sed peyan in. Di gotinê de em ji hev derdikevin. (Ji rûpela diwemîn binêrin)

FRENSA U CIVATA MILETAN

Frensê xwe ji civata Miletan bisûnda ne kişandiye.

Londre —: A. F. I: Sermiyanê Frensa Şerevanî General De Gol bi navê xwe û li ser Zimanê General Jîro, ji civata Miletan re, li Jenevê da zanîn ko Frensê xwe ji vê Civatê bi şûnda ne kişandiye û mîna berê lebata civata Miletan e.

BOMBARDIMANA ESSENÊ

Stokholm:— R. Rêwingiyên ko bajarê Essenê, piştî bombardimanên refên brîtanî bi çavê xwe dîtine, qise dikin û dibêjin: Essen ew şaristana elemanî a mezin, êdi ne bajar lê kavil û xerabezarek e, û xesarên ko gihane wî, ji yên ko berî bi sê salan giha bûn Londrê, bi deh caran bêtir in.

Elemanê di nav avahiyên febrîqan de dîwarine stûr çêkiri bûn, da ko der dema bombardimanan, avahî hemî bi hev re me kevin perîşaniyê; le belê ew bedenên stûr, di bin xurtiya teqandina bombeyine mezin, her yekê ji wan du hezar û çar hezar kîlo giran, mîna pelên daran we şiyane, Îro ji karxaneyên Essenê ên mezin û bilind, bi şûndemayî binyadên dîwaran û kavil û xirban e.

Ev mehek e di Essenê de kar û xebat sekiniye. Kes na şixule û nîvê xelken vê şaristanê, dev ji mal û milkê xwe ji kar û destxetên xwe berdane û ketine riya mihaciriyê. Bombayên brîtanî koka her du stasyonên Essenê jî rakirine.

Piştî bombardimana vî bajarî, bi tometa anîna talanê xelkê 4 xebatkerên elemanî û pênc ji yên biyanî, hatine bi dar ve kirin. Du rencberên elemanî yên ko çavtirsiyandî bû bûn û ne dixwestin dest bi paqijqirina xirbeyan bikin hatine mirandin.

Ji dikanên vî bajarî 500 heb hilwe şiyane û zad û zixîreyên tê de xira bûne. Niho di Essenê de ji esker û peyayên ko bi emrê hiku metê avahiyên xesardîtî hildiwe şinin û dikin ava bikin pê ve kes 'ne maye.

CIHABA BRITANYA MEZIN

Londre —: R. Hikûmeta Brîtanî duhî bi avakî resmî da zanîn: Li gora raporên ko digehin hikûmeta Brîtanya Mezin, eleman haziriya xwe dikin û di eniya Şerê Rûsî de, bi gazên jehrîn emel bikin. Heke elemana ev tişt kir, dîwê ew bizanin ko herveki serekwezîrê britanî Mr. Çorcil elam da bû, qiwetên Hevalbenda di bombardimanên qerargehên eskerî, merkezên febriqeyên çek û posatên şerî û bender û hejagehan de û hema, bi vê gazê dê emel bikin.

Ordiya azahi û serbestiyê

Cezayir.—: A. F. I. Radyoa Cezayirê duhî êvarê elam dida:

Leşkerên frensezî yên Ordiya Azahî û serbestiyê a mezin berê xwe daye Tûnis û Bizertê û pêş ve dikeve. Yekîniyên dijmina ê dawîn wexteki nizing de, ji erdê Efriqayê dê bêne qewirandin. Armanca yekemîn Ewripa ye. Hevalbenda nizîkî Ewripayê dibin û ala felat û serbestiyê bi xwe re tînin.

DESTGEHÊN EMERÎQANÎ 1265 WAPOR ÇÊKIRINE

Nû-York—R: Destgehen emerîqanî ji destpêka şerî û heta niha 1265 waporên bar û eskerkêş çêkirine.

Londre—R: Refên brîtanî bê etlahî dirêjî erdê germanistanê dikin û bajarên elemanî ên têr destgeh û febrîqan didin ber bomban û li hêjagehên eskerî dixin.

Di nav wan rejên dawin de, 600 bombeavêjên brîtanî dirêjî karxaneyên Skodayê kirine û 150,000 kîlo bombe avêtine wan febriqan yên ko li ser hisabê elemana tang, topên mezin, gule, otomobîlên zirhkirî, balafir û motorên gir û hûr çê dikin. Di febrîkeyên Skodayê de 55,000 peya dixebitin.

DURIK

Dûrikên li ber tenbûrê

MAM DELALÊ

Çi şikefta dev mezinê
Jê reviya refek jinê
Çavê min li a mezinê.

Çi şikefta dev li hewa
Jê firiya refek kewa
Çavê min li a bedewa.

Çi şikefta dev biçûk e
Jê firiya refek bûk e
Çavê min li a biçûk e.

Sibe bû, min karek ne kir
Destê lêwîk qipçe kir
Sê siwara xuyayî kir

Min go siwarino hon kî ne?
Go xwakê em xerîbî ne
Xwakê em rêwî ne.

DILO

Lo dilo! Hey lo dilo!
Xelkê me çû bûn çilo
Dinya hemî zewicî
Ez û gewrê man wilo.

Sing û berê te gewr in
Mîna dimis û fîro
Li ser destê xwe kiro
Mîrê Bota re biro.

Lo dilo! Hey lo dilo!
Agir ket sênca reza
Keti bû bexçê gula
Ezê biçeplê te bigrim
Bavêjim taxa fîla.

EDLÊ

Edlê rabe sibe ye
Dengê dikan çebe ye
Çax, çaxê min û te ye
Çaxê nimêja te ye

Hey lê, gidyê Edlayê
Bê sozê, sozwindayê
Malê dinyê hindikê
Qelena gewra min nayê

Sibe bû, dîka qîr kir
Cotkariya nîr li pî kir
Rêka şkeftê d' nîvî kir
Sînga gewrê sipî kir.

Heylê gidyê Edlayê
Min sozek bi te re dayê
Ez tu car na dim terkayê
Heta bi axa merzela
Heta bî kêlê kevirê
Bi şingina berê hesinî

Mala Edlê li neçebê
Lê hat bakî xezebê
Kul li Edlê giran bû
Da ser derdê kezebê

Mala Edlê li jor e
Dergûşê lor e lor e
Hêvî ma rebê jor e
Ezê bi çeplê te bigrim
Bavêm welatê jor e.

Dê Edlê! rabe, rabe
Dil ketîçare nabe
Kes li malê tu ne ye
Kêf, kêfa min û te ye!

MAMIK: Av e, ne av e, marê mirî di nav e, teyrê zêrîn hindav e. Qesra spî bê derî.

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

ROJA NÛ

XWEDÎ Û GERÎNENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIRXAN



www.kurdi.org

WEŞANÊN JÎNA NÛ

Weşanên Jîna Nû : 7
Dokument : 2
Çapa Yekem : Sibat 1986

www.arsivakurdi.org

Adres :
JÎNA NÛ FÖRLAGET
Post Box : 240 12
750 24 UPPSALA

Postgiro : 50 37 99- 9

ISBN : 91970747- 80

ÇEND GOTIN LI SER ROJA NÛ

Ev pirtûka destê we berhevoka hemû hejmarên rojnama Roja Nû ye. Roja Nû rojnamek hefteyî bû, ku di nabeyna 1943-1946-an de li Beyrûdê hatiye weşandin. Xwedî û berpirsyarê rojnamê rojnamegêr, nivıskar û zimanzanê bi nav û deng ê Kurd Dr. Kamûran Alî BEDIRXAN bû. Ciyê çapa rojnamê, wek ku li ser her hejmarê hatiye nivîsandin "Bêrût Birc: Weqif Tabet" bû. Rojname bi tevayî 73 hejmar derçûne û çapa hejmara yekem 3-ê Gulana 1943, ya dawî 13-ê Gulana 1946-a ye. Ebada orîjınala wê 30x46 cm ye. Her hejmarên wê 4 (hejmar-68, 2 r.) rûpel in.

Wek me li jor jî got, Roja Nû rojnameyek hefteyî bû. Lê ev yek heta hejmara dawiyê li ser hev ne meşiyaye. Ji hejmara 1-ê heta hejmara 12-a li pey hev, her duşembê derketiye. Hejmar 12 û 13 bi hev re çap bûne. Hejmara 14-a panzde roj piştî wan derçuye Ji hejmar 14 heta 23 dîsa her hefte li pey hev rojên duşemban lê hejmar 24 panzde roj piştî hejmara berê derketiye. Di pey re hejmarên 30, 31, 35, 38, 40, 45, 46 panzde roj piştî hejmarên berê derketine. Ji hejmara 49-a pê ve di panzde rojan de du hejmar derketine lê hejmarek bi Kurdî û yek bi Fransizî. Carina hejmarên Fransizî û Kurdî li pey hev, lê carina jî herdû bi hev re di yek rojê de çapbûne. Divê em bala xwendevanan bikşînin ser vê yekê jî ku di navbeyna hejmara 48-a û hejmara 49-a de rasterast salek û du meh zeman derbas buye. Hejmara 48-a di Gulana 1944-an de û ya 49-an di 15-ê Tîrmeha 1945-an de ji çapê derketiye.

Roja Nû bi Kurdî û Fransizî derket. Heta hejmara 49-an di her hejmarê de 3 rûpel bi Kurdî û rûpelek bi Fransizî ye. Lê hejmar 49 û pê ve hejmarek bi Fransizî û yek bi Kurdî derketiye. Hejmara dawî (72-73) bi hev re 4 rupel derketiye. Du rûpelên wê bi Kurdî û du rûpel jî bi Fransizî ne. Li ser beşê Kurdî hatiye nivısandin (hejmar 72) û li ser ê Fransizî jî (hejmar 73).

Roja Nû, rojnamek hefteyî ya siyasî bû. Lê gava em li naveroka wê dinêrin, em dibînin ciyê ku daye warê edebî û folklorî ji yê nûçe û gotarên siyasî ne kêmtir e. Loma jı di eslê xwe de rojnamek siyasî û çandeyî ye. Wek kovarên Hawar û Ronahiyê, Roja Nû ji ber ku di dema germahiya Şerê Cîhanê yê Duduya de hatiye weşandin, giraniya nûçe û gotarên wê li ser şerê navbera cepha demokrasî û cepha faşîzmê ye. Roja Nû jî ciyê xwe di cepha demokrasiyê de girtiye û li dijı faşîzmê rawestiyaye.

Di ware nûçe û gotarên siyasî yên rojane de, baweriya me ew e, ku Roja Nû ji Hawar û Ronahiyê bi rûmettir e. Di rûpelên xwe de gelek caran cîh daye nûçeyên jiyan û tevgera siyasî ya Kurdên Kurdistana Îraq û Îranê. Li ser wan hin dokumentên hêja çap kiriye. Herwekî mirov, programa Partiya Komunîst a Kurdên Iraqê û cardin beyanek Komela Xortên Kurdistan(Iranê) bi temamî li ser rupelên Roja Nû dibîne. Roja Nû, nûçeyên li ser Kurdên Kurdistana Iranê, ku di rojnameyên Îraniyan de derketine, bi kurtebirî be jî di rupelên xwe de weşandiye.

Cardin nûçe û gotarên li ser Kurda ku wê demê di çapemeniya cîhanê(bi taybetî di rojnamên bi zimanê Fransizî, Îngilîzî, Almanî, Erebî û Farisî de) de derketine, Roja Nû wan civandiye, ya bi tevayî yan jî bi kurtebirî di rupelên xwe de pêşberê Kurda kiriye. Carina hin nûçeyên li ser Kurdên Lubnanê û Kurdistana Suriyê jî di Roja Nû de cîh digirin. Hin gotarên siyasî, bi Kurdî di rojnamê de hatiye çapkirin, ku di warê rizgarbûna netewa Kurd, bi desxisttina mafên xwe yên millî û yekbûna welatê Kurda de, cardin di warê jiyana siyasî û civakî ya Kurdan de; herwekî di mesela demokrasiyê, avakirin û gerandina dewletê de bîr û baweriyên xwedî û berpirsyarê rojnamê bi eşkereyî pêşberî mirov dike. Di beşê Kurdî de ji bilî nivîsarên Kamûran Alî Bedirxan, em rastî gotar, helbest û nivîsarên Celadet Alî Bedirxan, Osman Sebrî, Cîgerxwîn, Hesen Hişyar, Qedrî Can, M. Ehmedê Namî û hinekên dîtir tên. Gotar û nivîsarên dîrokî li ser dîroka Kurd û Kurdistan ên hin nivîsarên Ewrûpî û Ereb jî bi wergera Kurdî di Roja Nû de cîh girtine.

Roja Nû ji alî çandeyî û folklorî de jî gelek dewlemend e û xezînek hêja ji çand û zimanê Kurdî re hiştiye. Tefsîra Quranê, piştî Hawarê di Roja Nû de hatiye çapkirin. Q. Can romana "Welatê Zembaqên Gewr" a Fînî, wergerandiye Kurdî û di Roja Nû de çap buye.

Di beşê Fransizî de, tê xuyakirin, ku armanc naskirina rewş, dîrok û daxwazên Kurdan bi biyaniyan buye. Piraniya rûpelên Fransizî li ser nuçe, gotar û nivısarên dîrokî, li ser daxwazên Kurda ne. Di beşê Fransizî de rojname bi eşkereyî dide xuyakirin, ku Kurdistan bi perçebûn û bindestbûna xwe, bi têkiliyên civakî, aborî û siyasî ve wek welatekî koloni ye û divê ji vê rewşê derkeve, bibe welatekî serbixwe û yekbûyî, ew jî wek ciranên xwe wek welatên din di jiyana hevçerx de ciyê xwe bigire.

Di beşê Fransizî de li ser edebiyat û nivîskarên Ewrupî, jiyana çandeyî ya wan welatan hin gotarên kurt jî hene. Dr. Kamûran Bedirxan stranên folklorî yên Kurdî wergerandiye zimanê Fransizî û di Roja Nû de çap kiriye.

Bi kurtî, Rojnama Roja Nû hem bi nûçe û gotarên xwe yên rojane yên siyasî û hem jî bi nivîsarên xwe yên çandeyî û folklorî xezînek gelek hêja ji netewa Kurd re hiştiye. Bi ji nûh ve çapkirina vê rojnamê, em bawer dikin, ku xizmetekê ji gelê xwe re dikin.

JIYANA KAMÛRAN ALÎ BEDIRXAN

Kamûran Alî Bedirxan di 21'ê Tebaxa 1895'a de li Îstenbol jì dayika xwe bû. Ji malbata Bedirxaniyan; kurê Emîn Alî Bedirxan e .

Wek ku tê zanîn, bapîrê Kamûran Alî Bedirxan; Bedirxan Begê Mîrê Cizîra Botan, ji bo Kurdistanek serbixwe, di nabera salên 1843-1946'a de li dijî Împaratoriya Osmanî serî hilda. Ev serîhildan hat şikandin û Bedirxan Beg tevi malbataxwe, di 1847'a de sirgûni Girît'ê bû. Qasî çarde salan li Girîtê ma, dawiyê wî şandin Sûriyê û milkê mîraniya wî jê stendin tevî erdên Împaratoriya Osmanî kirin. Piştî ku Sultan Abdulhamîd ê II. a hat ser hukum, sirgûna mala Bedirxan Beg rabû, lê Abdulhamid nehişt ew vegerin welatê xwe, anî wan li Îstenbol, di bin lepê xwe de bi cîh kir. Gava Kamûran Alî Bedirxan hat dinê, malbat li Îstenbol cîwarkirî bû.

Kamûran Alî Bedirxan, xwendina xwe ya ewil li Îstenbol xelaskir. Di 1912'a de gava Şerê Balkan derket, di 17 saliya xwe de bi dilxwaziya xwe, xwe nivisand leşkeriyê û ji bo "doza îslamê" çû şerê Balkan. Lê siyaseta netewayî ya şoveni ya Îttîhad û Terakî wek hemû endamên neteweyên bindest, tesirek mezin li wî jî kir. Ew jî baş tê gehîşt ku "doza îslamê, yekîtiya milletên musliman û bratiya wan" di bin nîrê Împaratoriyê de peyvek vala ye. Malbata ku jê dihat, xebata wan jibo bi destxistina mafên milletê Kurd hê jì piçûkatî de tesîr li Kamûran Bedirxan kiribû ku bi hest, hişyarî û ramanên netewayetî bighê. Siyaseta neteweperestiya Tirk a Îttîhad û Teraki û derketina Şerê Cîhanê yê Yekem, buyerên şer bi temamî rê li ber vekir ku bi her awayi xwe bide doza xelasî û bi destxistina mafên netewayetî yên milletê Kurd.

Piştî Şer, İmparatoriya Osmanî teslîm bû, mutareka ku biserketina Hevalbendan (İngiliz, Fransiz, İtalî, Amerîkî) îlan dikir hat îmza kirin. Hevalbendan gelek erdên bin destê Împaratoriya Osmanî dagîr kiribûn. Başûrê Kurdistanê seranser, hinek beşên nîv girava Anadolê, beşek ji Tirakya jî ketibû bin destê wan. Piştî mutarekê Hevalbendan dest danîn ser paytexta İmparatoriyê İstenbol ji.

Berî xelasiya şer, serokcumhûrê Amerîka Wilson li ser şertên dawî lê anîna şer hinek prensîb pêşkêş kiribû. Di xelasiya şer de çi welatên biserketî û çi jî yên têkçûyî; hemiyan jî aşkera dikirin ku bi chatina van prensîba qebûl dikin. Ji xwe şer, di esasê xwe de, li ser qebûlkirina bi cih anina van prensîban ji bal hemû welatên şerbêş, dawî lê hatibû.

Yek ji prensîbên Wilson jî ew bû, ku piştî şer milletên bindest ên Împaratoriya Osmanî qedera xwe bi destên xwe tayîn bikin û bighên hemû mafên xwe yên netewayî. Ev prensîb ji bal milletên bindestê Împaratoriya Osmanî; Kurdan, Ermeniya, Roman, Ereban û yen dîtir, bi kêfxweşiyek mezin hatibû qebûlkirin. Loma jî tevgera van milletan piştî şer ji nuh ve aktîfiyek mezin girt xwe.

Rizgarîxwaz, ronakbir û kesên siyasî yên milletê Kurd jî li xwe werqilîn û bi xwîngermî ketin xebatê. Bi taybetî li İstenbol, komale, partî hatin damezirandin û rojnamên Kurdan dest bi weşanê kirin. Di vê tevgerê de yê ku ciyekî berbiçav girt Komela Bilindbûna Kurd (Kürt Teali Cemiyeti) û kovara Jîn bû. Gelek kesên navdar ên tevgera nîştimanî ya Kurdistan di vê komelê de cih girtin û di warê siyasî û dîplomasî de doza bidestxıstına mafên milletê Kurd kırın. Gelek şûbên vê komelê li Kurdistanê jî hatibûn damezirandin.

Kamûran Alî Bedirxan wan salan herçî gelek xort bû (24-25) jî, wek endamekî pêşketî yê berbiçav di vê xebatê de ciyê xwe girt. Em dibînin ku di wan rojan de Kamûran, di kovara Jin û rojnama Serbestî de bi navê xwe gotaran çap dike û doz dike ku mafên milletê Kurd li gor prensibên Wilson bên dayin.

Di dawiya sala 1919'a de ji ber gelek sedeman, dubendî di nabêna endamên Kürt Teali Cemiyeti de derket. Sedemek esasî ew bû; ku ji endamên komelê hinekan doza serxwebûna Kurdistanê dikirin û hinek jî li dij bûn ku Kurdistan veqete. Wan dixwest di çerçewa İmparatoriyê de otonomî ji Kurda re bê dayin li ser vê dubendiyê gelek ji endamên komelê yên ku doza serxwebûnê dikirîn veqetiyan û bi navê Teşkilat-ı İçtimaiye Cemiyeti (Komela Teşkilata İçtimai) komelek nuh avakirin. Piraniya van kesan berpirsiyar û niviskarên kovara "Jîn"ê bûn. Piştî cudabûnê Jîn êdî ne wek kovarekê lê wek rojnamek rojane jî bal wan ve hat weşandin. İro di hin çavkaniyan de hinek agahdarî di derheq rojnama Jîn de hene. Lı gor çavkaniyekê (Abdullah Cevdet ve Dönemi, M.Şükrü Hanioğlu r. 297) em tê dighen ku bi kemasi 32 hejmar derketiye. Lewra ew çavkani jî hejmara 32 a ya rojnama "Jîn" ê tiştina pêşberi mirov dike.

Kamûran Alî Bedirxan jî jî wan kesan bû ku doza serxwebûna Kurdistanê dikirîn.

Li ser kar û barên komela "Teşkilat-ı İçtimaiye Cemiyeti" û rojnama Jîn, peywendiyên wan bi Kurdistan re heta niha nehatiye rawestan û nehatiye ronikirin. Lê hin buyer hene ku mirov dighînin wê qenaetê ku ev komele û rojnama Jîn bi Kurdıstanê re peywendî danîne, tesira wan li ser tevgera Kurdî li welat çêbuye. Bı taybetî jî li ser komelên herêma Xarpêt û Dêrsimê. Nurî Dersimî di kitêba xwe ya bi navê Di Dîroka Kurdistanê de Dêrsim (Kürdistan Tarihinde Dersim) de di de xwuyakirin ku ew û gelek xortên Kurdên Dêrsimê ji li hember otonomixwazan rabûne û wan jî ciyê xwe li ba dozdarên serxwebûne girtine. Cardin Alî Kemal di kitêba xwe ya bi navê Dîroka Erzincanê(Erzincan Tarihi) de dibêje, ku Elişêrê katibê Haydar Beg, li Koçgirî, li nav eşîretan digeriya bi dengbêjiya xwe doza serxwebûna Kurdistanê dikir, rojnama Jînê û belavokên li ser mesela serxwebûna Kurdistanê di nav xelkê de belav dikir.

Serokeşirên herêma Koçgirî hem di komelên Kurdî yên wan herêman de cîh girtibûn û hem jî peywendiyên wan bi tevgera Kurdî ya li Istenbol re hebû.

Di dawiya havîna 1919-an de Kamûran Alî Bedirxan,

Celadet Alî Bedirxan, Ekrem Cemîl Paşa û hin kesên din, di riya Derya Spî re, pêşî hatin Helebê dawiyê berê xwe dane Kurdistanê. Di 3'yê 1919-an de gihaştin Meletiyê. Miteserifê Meletiyê Xelîl Rahmî(ku ew jî Bedirxanî bû) pergî wan hat.

Her dı wê demê de Mistefa Kemal û hevalbendên wî jî Kongra Sêwasê dicivandin. Mistefa Kemal di riya fermandarên hêzên leşkerî yên Osmanî yên di herêmê de, rê li ber wan girt. Leşker şand ser wan. Kamûran Bedirxan û hevalên xwe mecbûr man ber bi Adiyeman-Kextayê vekişiyan, hatin nik Bedir Axa. Kamûran Bedirxan û hevalên xwe piştî ku di armanca xwe de bi ser neketin, cardin vegeriyan Îstenbolê.

Di dîroka Kurdistanê de ev mesela han jî heta îro roni nebuye. Mistefa Kemal di Nutuka xwe de îddîa dike, ku Bedirxanî ji bal Îngilîzan û Hukumeta Îstenbol ve hatin şandin wê herêmê da ko êriş bibin ser wan û nehêlin Kongra Sêwasê bicive, tevgera wan pûç bibe. Cardin ew dibêje, ku sîxurê Ingilızî Bînbaşî Noel jî bi wan re bû û li herêmê bi nokerê Hukumeta Îstenbolê waliyê Xarpêtê Ali Galip re yek bûn.

Gava mirov li ser vê meselê hûr radiweste, erê xuya dibe ku armanca Bedirxaniyan yek jê jî ew bû, ku nehêlin Mistefa Kemal û hevalên wî li Sêwasê kongrê bicivinin û di herêmê de li ser navê Kurdan karbikin. Û di vê niqtê de wan û waliyê Xarpêtê Ali Galip hin kar bi hev re kirine. Lê vê yekê tu carî nade xuyakirin, ku ev kar li ser navê Ingilîzan yan li ser hesabê Hukumeta Îstenbolê dihat kirin.

Ji xeynî îddîayên Kemalistan ên bê binî û belge, heta îro belge nînin, ku Ingilîzan bi Noel re Bedirxanî şandin ji bo karûbarê Kemalîstan pûç bikin û nehêlin Kongra Sêwasê bicive. Her çiqas Bedirxanî û Noel di demekê de hatibûn Kurdistanê lê bi hev re nehatibûn. Bedirxanî li Helebê rastî Noel hatibûn. Armancek resmî ya çûyina Noel hebû û ev rasterast bi armanca Bedirxaniyan ve ne giredayî bû. Noel li ser navê Konferansa Aşîtiyê Ya Parîsê resmî hatibû şandin ku ji bo haziriya Konferansa Parîsê raporekê li ser demografya Şerqê Anadolê hazir bike. Ango li wê herêmê nifûsa Tirka, Kurdan û Ermeniyan tespît bike. Vî karî jî ne bi dizî lê di riyek resmî û eşkere de dikir. Lê ji ber ku karê wî çavê Kemalîstan ditirsand û li hesabê wan nedihat, rê li ber girtin, wî bi hin karên "ne qanûnî" ve giredan da ku li herêmê negere û paşde vegere.

Noel û Bedirxanî heta Meletiyê bi hev re çûbûn, lê li gor ku B. Nikitin dibêje; di dema têkçûna Osmaniyan da reîsên Kurdan, di 1919-an da li Kexta ya nêzî Meletiyê xwestin tevgerekê dijî Kemalîstan rakin. Şefê servîsa Îstixbarata Îngilîzî yê li Helebê Albay Bell, hat wir li ser navê hukumeta xwe ji wan xwest ku dev ji vî karî berdin û li ser navê hevalbendan waad dida Kurdan ku di konferansê de dê daxwazên millî yên Kurda li ber çav bên girtin.(Nikitin c.1 r.38. Tirkî)

Di 12'yê Îlona 1919-an de motemedê siyasî yê bilind ê Îngilîzî Albay P.Peel hat Meletiyê ji fermandaren leşkerî yên Tirk re da xuyakirin, ku wazîfek Noel a tevliheviyê çekirin nîne, haya wî ji tiştekî wiha tune û ger tiştekî wiha hebe wê Noel derdest bike bişîne Helebê.(Z. Saruhan, Kurtuluş Savaşı Günlüğü C.2,r.98)

Qasî ku ji lêkolînê mirov tê digihîje Noel di dema gera xwe de sempatiya xwe ji Kurda re dide nîşandan, lê wek hinek dîroknas jî dibêjin ev ne netîca siyaseta Hukumeta Ingilîz, lê ji ya ramanên wî yên şexsî bûn. Lewra wê demê, piştî ku li Rûsya ordiya Danikin û Kolçak li hember Ordiya Sor şikiyan û Ingilîzan dîtin, ku ne hukumeta Musewat A Azerbeycan, ne Hukumeta Menşewîk a Gurcîstan û ne jî Hukumeta Taşnak a Ermenîstan wê xwe negirin û nikaribin li hember Bolşewîkan bibin bendek, ji bo wan welatek tenê mabû, ku "rê li ber Bolşewîzmê bigire" ew jî Tirkiya Kemalîst bû. Loma jî Ingilîzan nedixwest, ku Tirkiyê perçe bibe. Tirkiyek perçekirî û biçûk li dijî Bolşewîzme nikaribû mafê wan bı parêze. Erê di hin tiştan de ew û Kemalîst ne li hev bûn. Lê wan di siyaseta xwe de ne ku dixwestin Kemalistan "tenkîl" lê dixwestin bi nermî "tedîb" bikin. Alîkariya Kurdan ji bo damezirandina Kurdistanê û perçekirina Anadolê ne dibû "tedîb"(terbiyekirin) a Kemalîstan lê dibû pûçkirina wan.

Loma jî mirov dikare bêje, ku ne Bedirxanî li ser hesabê Îngilîzan çûbûn Kurdistanê û dest bi tevgerê kiribûn ne jî Îngilîzan alîkariya wan dikirin. Peywendiyên ku hebûn jî li ser esasê têkiliyên şexsî û di warekî pir teng de bû.

Li alî din tifaqa Bedirxaniyan û waliyê Sêwasê Ali Galip erê hebû lê bes di niqtekê de bû. Di gelek niqtan de (û bi taybetî di mesela Kurdistanê de) wan û Ali Galip li hev nedikirin. Ali Galip li ser navê Hukumeta Îstenbolê dixwest rê li ber Kongra Sêwasê bigire lê ne dixwest ev karê han feydê bigihîne tevger û armanca Bedirxaniyan. Loma jî, tifaqek esasî di navbeyna wan de pêk nehat û ji ber ku Ali Galip bi tûjayî li dijî tevgera Kurd bû, zû têk çû.

Piştî van çend niqtan a çêtir ber bi hiş diçe ew e, ku Bedirxanî li ser navê tevgera Kurdên li Istenbolê(û îhtîmalek mezin li ser navê Teşkilat-ı İçtimaiye Cemiyeti) hatibûn şandin Kurdistanê û wan dixwest xwe bigihînin eşîrên Dêrsimê, Koçgiriyê, ku li ser esasê serxwebûnê ji her derê Kurdistanê bêtir aktîfî ketibû nav wan.

Bi baweriya me her ev sedem e, ku vî karê han Mistefa Kemal pir tirsandiye û hewqas li dijî vê hatinê rawestiyaye. Wek ku tê zanîn tevgera Kurdên Dêrsim û bi taybetî Koçgirî (Sêwasê) dawiyê bû serîhildanek gur ku bi navê Serîhildana Koçgiriyê tê nasîn. Vê niqta han heta îro ji bal dîrokzanan nehatiye ronîkirin loma jî heta îro ne armanca esasî ya Bedirxaniyan û karê wan ê wê demê û ne jî peywendiya Serîhildana Koçgiriyê bi komelên netewayetî yên Kurd û bi rojnama Jîn û tesîra wan li ser serıhildanê nehatiye eşkerekirin. Divê, di vê niqtê de lêkolînên nuh ên fireh çêbibin.

Hêjayî balkişandinê ye, ku em bêjin, Prof. M. A. Hasretyan tevgera Bedirxaniyan a ku em li ser radiwestin bi navê "Serıhildana Kurdan Ya Meletiyê" binav kiriye.

"... Piştî ku tevgera rizgarîxwazî ya Tirk di bin serokatiya Mistefa Kemal de bi serket, hemû mafên Kurdan hatin înkar kirin, serokên Kurdan ên ku ji bo mafên milletê Kurd şer kiribûn ji welat hatin bi dûrxistin, êrîşek tûj û tund çû ser milletê Kurd. Di vê demê de, di derheq Emîn Alî Bedirxan û her sê lawên wî de fermana dardekirinê derket. Emîn Alî Bedirxan û kurê wî Sureyya Bedirxan çûn, li Misrê bi cî bûn. Kamûran û Celadet jî çûn Almanya, dest bi xwendina bilind kirin".(Pêşgotina Berhevoka RONAHİYÊ- Jîna Nû)

Di dû xwendina xwe ya bilind re Kamûran Alî Bedirxan carek din bi aktîfî di tevgera siyasî ya rizgarîxwaziya netewa Kurd de ciyê xwe girt. Di Xoybûnê de wek endamekî pêştî kar kir û di amadebûna Xoybûnê ya ji bo şerê çekdarî ya dema Serîhildana Agirî de xebitî. Lê ev kar bi serneket û Xoybûnê nekarî tevî şerê çekdar ê Serıhildana Agiriyê bibe

û li herêmên din ên Kurdistanê agirê serîhildanê pêxe. Piştî vê têkçûnê, Kamûran Alî Bedirxan çû Almanya li Fakulta Hiqûqê a Leipzigê nama xwe ya doktorî çêkir.

Piştî doktoriyê, Kamûran Alî Bedirxan hat li Beyrûdê dest bi avukatiyê kir. Di vê demê de Kamûran Alî Bedirxan ji alîkî de avukatiya xwe dikir ji alî din de jî dest bi nivîskarî û rojnamegêriyê kir. Di salên 30'î de û di nivê yekem ê salên 40'î de hem bi Kurdî û hem hin bi zimanên din gotar û pirtûk nivîsand. Gotar û helbestên wî, wergerên wî, berhevokên wî yên di warê folklorî de di kovarên birê wî Celadet Alî Bedirxan de; di Hawar û Ronahiyê de çap dibûn. "Tefsîra Quranê, Hedîsên Cenabê Pêxember û Çarînên Xeyam" bi Kurdiyek xweş û bilind hatine wergerandin û di Hawarê de çap bûne.

Di destpêka Gulana 1943-an de dest pêkir li Beyrûdê rojnama Roja Nû ya hefteyî weşand. Wek me berê jî got, rojname çar rûpel bûn; sê rûpelên wê bi Kurdî û yek jî bi Firansizî, dawiyê rojname hem bi Kurdî hem jî bi Firansizî derket. Kamûran Alî Bedirxan di rojnamê de ji alîkî de cîh dida edebiyat û folklora Kurdî, dîroka Kurdistanê û jiyana Kurdewarî ji alî din de jî bîr û baweriyên xwe yên mesela Kurd dida xuyakirin. Doza yekîtî û serxwebûna Kurdistanê dikir. Di beşê Firansizî de jî daxwazên Kurda doza mafên netewayetî yê Kurdan û jiyan û dîroka Kurdan bi biyaniyan dida naskirin, bala wan dikşand ser vê meselê.

Jibilî rojnama Roja Nû, Kamûran Alî Bedirxan li Beyrûdê, di 6-ê meha 12-a 1943-an de Kovara Stêr a mehane jî derxist. Ev kovar jî wek zêdayiya Roja Nû sê hejmar derketine. Weşana Roja Nû di bihara 1946-a de rawestiya.

Di sala 1947-an de Kamûran Alî Bedirxan çû Fransayê. Li wir Sazgeha Lekolînî Ya Kurdî sazkir û bû berpirsyarê vê sazgehê. Vê sazgehê bi navê Bulletin du Centre d'Etudies Kurdes(Bultena Merkeza Lêkolînî ya Kurd) bultenek înformasyonî derdixist û têde haydarî yên derheq pirsa Kurdî de raberî biyaniyan dikir, bala wan dikşand ser vê meselê.

Di sala 1948-an de ew çû Dewletên Yekbûyî yên Amerika û memorandûmek li ser rewşa gîştî ya Kurda pêşkêşî Sekreterê Gîştî yê Neteweyên Yekbûyî kir.(Azadî, j.4 Kanûn 1978)

Di vê demê de li Xwendegeha Zimanên Rohelatî yên Jîndar(Zanîngeha Parîsê) dest bi hînkirina zimanê Kurdî kir. (a.n.d.)

Li vir bi giranî xwe da xebata zimanê Kurdî û çanda Kurd. Ferhengek Kurdî-Firansizî, çend pirtûkên gramera Kurdî çêkir, li ser ziman û çanda Kurdî gelek konferans da û lêkolîn çêkir. Di rojnamên Awrûpî de li ser mesela Kurd gotar nivîsand û ji bo ku doza milletê Kurd ragihîne raya gîştî ya Awrûpa, herçî fersendên ku ket ber dest jê feyde girt, rewşa Kurda da naskirin.

Di sala 1954-an de ew bi Nathalie d'Ossovetzky ya Polonî re zewicı.(a.n.d.)

Kamûran Alî Bedirxan di sala 1961-an de peywendî bi serokê tevgera millî a Kurdistana Iraqê Melle Mistefa Berzanî re danî û ji wê salê pê ve heta mirina xwe wek endamekî pêşketî yê siyasi yê tevgera Kurdî li derveyî welat xebat kir, deng û bahsên pêşmergên Kurdistana Iraqê li derveyî welat belav kir, di naskirina doza vê tevgerê de rolek mezin leyîst. Berzanî bi çavekî nuneriyê lê dinêrî û wî li Ewrûpa nuneriya tevgerê dikir. Di sala 1970-î de ew û jina xwe çûn Kurdistana Îraqê û demekê li wir ma. Di dawiya jiyana xwe de çûna wî ya Kurdistanê tesîrek mezin lê kir û gava vegeriya Fransa "wan helbestên destanî, qîrînên dawî yên merivekî" ji qelema wî rijiyan. Di Sibata sala 1975-an de jina wî mir, piştî wê bi 15 rojan tevgera Kurdistana Iraqê têkçû. Vê yekê jan û êşek giran xist dilê Kamûran Alî Bedirxan.

Vî xebatkarê heja yê tevgera rizgarîxwazî û rewşenbîriya Kurdî, di 4-ê Çileya Pêşî sala 1978-an de li Parîsê çave girt, xatirê xwe ji dinyayê xwest. Li ser wesiyeta vî mirovhiz û nefspiçûkê Kurd, laşê wî dan Fakulta Tibbî ya Parîsê ji bo lêgerînên zanistî.(a.n.d.)

Kamûran Alî Bedirxan hem têkoşerekî siyasi yê hêja û hem jî ronakbîrek Kurd yê jêhatî bû. Di warê edebî û zimanzanî û pêşdexistina zimanê Kurdî de xebatek gelek hêja kir. Ji bilî Kurdî, bi Tirkî, Erebî, Elmanî, Firansizî zanîbû.

Ji bilî gotarên wî yên di Hawar, Ronahî, Stêr, Roja Nû, Jîn, Serbestî û rojnamên Ewrûpî de çapbuyî, afirandinên wî ev in:

1- Elfaba Min, Çapxana Hawarê, Şam 1938, 32 r.
2- Langue Kurde, Paris 1953, 253 r.
3- La Queztion Kurde, Paris, 1959
4- Le Kurde Saus Paine, Paris 1965, 172 r.
5- Der Adler von Kurdistan, Postdam 1937
6- Destpêka Xwendinê, Paris 1971, 165 r.
7- La Lyre Kurde, Le Calvaire du Kurdistan(Helbestên Fransizî)
8- Çarînên Xeyam
9- Dilê Kurên Min, Kitêpxana Hawarê
10- Elfabeya Kurdî, Kitêpxana Hawarê
11- Xwendina Kurdî, Kitêpxana Hawarê, Damascus 1938
12- Dersên Şerîetê, Kitêpxana Hawarê
13- Proverbes Kurdes(Metheloken Kurdî) Lucy Paule, Margueritte û Kamûran Alî Bedirxan, Paris 1937
14- Le roi du Kurdistan(Qralê Kurdistanê) Kamûran Alî Bedirxan û Adolphe de Falgerolle. Paris 1937
15- Der Adler von Kurdistan(Eyloyê Kurdistanê) Kamûran Alî Bedirxan û Herbert Örtel. Berlin 1937)
16- Der Schnee Des Lichtes(Berfa Ronahiyê) Şihrên Kurdî. Kamûran Alî Bedirxan û Dr. Curt Wunderlich, Berlin 1937
17- Edirne Sükûtunun İç Yüzü. Kamûran Alî Bedirxan-Celadet Alî Bedirxan, Çapxana Serbestî.
18- Ji Tefsıra Quranê. Paris 1971
19- Le Dossier du Kurdistan du Sud(Dosya Kurdistana Başûr) Paris 1965
20- Fêrbûna Xwendina Kurdî, 1968 Paris 61 r.
21- Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer. Çapa 2-a Özgürlük Yolu İstanbul 1977 60 r.
22- Zmanê Mader, la langue Maternelle, alphabet et lectures Kurdes, Paris 1965
23- Zmanê Kurdî - Gramera Kurdî- Tirkî. Dr. Kamûran Alî Bedirxan û S. Şivan. Weşanên Kawa, İstenbol 1976
24-Nivîsa Min, mon livre cours pratique de la langue Kurde, Paris, 1965
25- Livres scolaries Kurdes, Damas 1937
26- Le calvaire du Kurdistan(Helbestên Fransizı), Paris 26 r.

Afirandinên Çapnebûyî:

1- Ferhenga Kurdî- Firansizî
2- Ferhenga Fransizî- Kurdî
3- Tefsîra Quranê (jê tenê hin sûre çap bûne)
4- Çar Încîl

JÎNA NÛ